Dayik û bavên rêzdar,

Perwerdeyî pêdiviya herî girîng e bo zarokên we, da ku li Elmanya bibin xwedan jiyaneke baş. Lewre bi vê nameyê em dixwazin agahiyên herî girîng li ser derfetên perwerdeyiyê li wilayeta Rheinland-Pfalz bidin we.

Perwerdeyî û fêrbûn li Rheinland-Pfalzê ji qonaxa Gulîstana zarokan (Kindergarten) ve dest pê dike. Zarokên we dikarin li Gulîstana Zarokan ligel zarokên din bilîzin û hevalên nû peyda bikin. Û berî hertiştî ew li wir fêrî zimanê elmanî dibin. Zarok di rêya lîstina bi hev re zûtir fêrî zimanê biyanî dibin. Lewre zor pêwîst e ku zarokên we, di zûtirîn dem de, herin Gulîstana zarokan.

Li Rheinland-Pfalzê ji mafê her zarokekî ye; temenê wî salek derbas kiribe, here Gulîstanê. Ev tê wateya ku zarokên we bi her hal, dema bibin du salî, cihek ji wan re li Gulîstana zarokan, bêpere, tê terxankirin.

Hûn dikarin hertiştî bi hûreyî, ligel perwerdekarên Gulîstanê gotûbêj bikin. Herweha hûn dikarin di heftiyên destpêkê de li Gulîstanê ligel zarokên xwe bimînin, da ku hun bibînin bê rewş û pêvajoya zarokên we li Gulistanê çawa derbas dibin.

Li Elmanyayê bo me pir girîng e ku hûn , wek dê û bav, baweriya xwe bi perwerdekaran bînin û ligel wan hevkar bin. Herdem pirsên xwe ji wan bikin!

Gulîstan ji zarokên biçûk re, ber bi welatê nû ve, gava yekê ye. Zarokên mezintir li Elmanyayê diçin dibistanê.

Fêrbûna çalak, perwerdeya baş û bawernameyeke serkeftî li Elmanyayê mercên jiyanek û karekî baş in. Ji ber ku fêrbûn pêwîst e, her zarokek li Elmanya neçar e ku biçe dibistanê. Ev tê wateya ku li wilayeta Rheinland-Pflaz jî, li gor zagonê (§56 Schulgesetz ) , divê her zarokek biçe dibistanê.

Da ku zarokên we li dibistanê serkeftî bin, divê ew zû fêrî elmanî bibin. Bo vê yekê dibistanên Rheinland-Pfalz korsên zimên pêşkêş dikin. Di van korsan de, di heftiyê de, wê ta 20 demjimaran zimanê elmanî were hînkirin. Di rex wane(ders)ên elmanî de, wê zarokên we ji destpêkê ve di waneyên ku yekser ziman jê re navê, ligel hevalên xwe yên elman, di wanegeh( sef)ê de bin. Weha wê zarokên we peywendiyê ligel

hemtemenên xwe yên elman  bikin,  û hevalên nû peyda bikin.  Mîna waneyên  Huner, Mûzîk, Sport û Inglîzî (eger zarokên we bi inglîzî zanibin).

Dibistaneke baş pêwîstî  bawerî û hevkariya dê û bavan û mamosteyan û şagirtan e. Li dibistanê jî hûn dikarin agahiyan li ser derfetên xwendinê  li elmanya bidest bixin. Lewre hûn herdem dikarin û divê ku hun pirsên xwe ji mamoste û rêvebirê dibistana zarokan bikin.

Baştirîn daxwaz bo we li Elmanya û bo zarokên we demên şad li Gulîstana zarokan û serkeftin li dibistanê.

Irene Alt

Wezîra Dewletê ya Integrasyon,
Malbat , Zarok, Ciwan û Jinan

Vera Reiß

Wezîra Dewletê ya Perwedeyî,
Zanyarî, Pêşperwerdeyî û Kultûrê